



Komisyona Lêpîrsînê ya Sûriyê ya Navneteweyî ya Serbixwe ya Neteweyên Yekbûyî, rapora têkildarî Sûriyê ya xwe dispêre xebata li qadê yên di navbara 21'ê Çîle-Hezîranê de hatibû amadekirin, eşkere kir. Rapoa ku li 45. ya Rûniştina Mafê Mirovan a li Ofîsa NY ya Cinêvê hat nîqaşkirin, Serokê Komisyona Lêpîrsînê Paûlo Sérgio Pinheiro bi daxuyaniye-ke çapemeniyê eşkere kir. Di raporê de hat diyarkirin ku aktorên bi çek ên li Sûriyê hemû bi domdarî sivîlan di-kin hedef û hat gotin, “Tevî agirbestê jî, Sûriyeyî tîn kuştin û binpêkirinên mafan dibin. Rapora ji 25 rûpelî bal kişan-diye ser binpêkirinên mafan ên çekdarên li herêmê û hat gotin êrişên zayendî yên li ser jin û zarokên keç, tundiya li ser sivîlan, bi zorê destdanina ser milkên taybet her ku diçe zêdetir dibe. Raporê herwiha cih daye binpêkirinên mafên mirovan ên hêzên hikûmeta Sûriye û komên terorist ên cîhadî yên li Idlibê, herwiha sûcên şer û yên dewleta Tirk a li Efrîn û Serê Kaniyê jî. Di raporê de bal hatiye kişandi-na ser van xisûsan:

ÎŞKENCE, DESTESERKIRIN Û TALAN

“Hêzên SMO di serî de bi xezt, Îşkence û zorê dixwazin di serî de Kurdan welatîyên herêmê ji herêmê derxin. Malên tay-

bet ên gelek kesî hatin dizîn û talankirin. Malên ku bi zorê tîn desteserkirin û valakirin şervanên SMO yan jî malbatên wan dikevinê. Welatîyên Kurd bi sistematîk tîn Îşkencekirin. Hêzên SMO'yê li herêma Efrînê Kurdan ji cihê wan dikin, bi zorê dest datînin ser milk û emlakên wan. Tûgaya Suleyman Şah mal bi mal digerin, bi amanca kesên ji derveyî Efrînê tîn ji bo bi cih bikin, malbatên Kurd ên jêrî 3 ferdî ji malên wan derdixin. Dîsa welatîyên Kurd ji bo li ser ax û warê xwe bijin bac ji wan tê girtin. SMO li Efrînê mal bi mal digere û ji walatîyên Kurd daxwaziya belgeya xwedîbûna mulkiyetê dike, yên ev belge nebe, bi zorê ji malên wan derdixin û koçber dikin.

BI ZORÊ DIDIN KOÇKIRIN Û DEST DATÎNIN SER MALÊN WAN

Mîna Efrînê Serê Kaniyê ya bi ‘Tevgera Barîş Pinarî’ a Cotme-ha 2019'an ji ber şer Kurdên ku neçar mabûn malên xwe biterikînin, hêzên SMO dest danîne ser mal û milkên wan. Bi vî awayî rê nayêdayin ku ew welatî vegerin. Hêzên bi çek ên li herêmê malên Kurdan îşaret dikin û sivîlan neçarî koçberiyê dikin. Yên vedigerin jî neçar dikin dîsa koçber bibin. Kelûpelên nava malan hatin dizîn li cihên cuda tîn firotin. Tûgaya Sûltan Mûrat kelûpelên

NY: Sûcên şer li Efrîn û Serê Kaniyê tîn kirin

Raporekê NY amade kirî balê dikişîne ser sûcên şer û mirovayiyê yên dewleta Tirk û çeteyên wê yên li Efrîn û Serê Kaniyê kirîn.

ku dizîn li depoyekê kom kirin û piştî dubare difiroşin xwediyê malan. Ev jî dide nîşandan ku polîtîkayeke berê hatiye amade-kirin. Tûgaya Hamza bi zorê dest datînin ser malên Kurdan û piştî jî van malan girêdayî sazi-yeke dewleta Tirk dike an jî dike navendeke ya qûrsa Quranê. Vekirina van navendan jî ji aliyê Waliyê Rihayê ve hatiye kirin. Dîsa Hêzên Biçek ên Tirk malên sivîlan ên li Gundê Dawitiyê bi amanca leşkerî bikartîne. rê nadin ku welatîyên vî gundî vegerin ser malên xwe. TSK di meha Nîsan û Hezîranê de hinek malên vî gundî şewitandin û hienk jî bi armancên leşkerî bikar tîne.

Welatîyên Efrîn û Serêkaniyê yên bi awayekî sistematîk malên wan tîn dizîn, dema ku serdanê li rayedarên bilind ên SMO'yê dikin, berdêla vê êşkence, revandin û piştî revandinê jî li pêşberî pereyan tîn berdan.

RAYEDARÊN TIRK LÊPIRSÎN Û ÊŞKENCE DIKIN

Kesên li Efrîn û Serêkaniyê ji aliyê hêzên SMO'yê ve tîn destgîrkirin û piştî tîn girtin û êşkencekirin bi hinceta ku berê têkiliya wan bi Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê re hene û ev kes ji aliyê rayedarên Tirk ve tîn lêpîrsîn. Mirovên ku li Efrînê tîn girtin piranî li girtîgehên navendî ya Efrîn an jî li avahiya Lîseya Aborî ya Efrîn û îro ji weke Biryargeha Polîsên Leşkerî ya SMO tê bikaraîn di girtîgehên bin erdî de tîn ragirtin. Hinek girtî jî nayê zanîn birine kû û agahî bi malbatan re nayê par-vekirin. Her wiha sivîlên eslê xwe Kurd û dîsa welatî ji ber ol û netewa xwe tîn lêpîrsîn û bi rojan tîn

êşkencekirin, bîrsî û bê av dihêlin. Du jinên ku Mijdara 2019'an hatibû destgîrkirin ji aliyê hêzên SMO'yê ve li Serêkaniyê dema ji aliyê rayedarên Tirk ve diha-tin lêpîrsîn hêzên SMO bi destavêtina wan ew tehdît kiriye.

JINÊN ÊZIDÎ NEÇARÎ ÎSLAMYETÊ DIKIN

Li Serêkaniyê jin jî di nav de gelek sivil ji aliyê SMO'yê ve hatin destgîrkirin û bi hinceta têkiliya ‘bi terorê’ re ji aliyê rayedarên Tirk ên li herêmê ve sewqî Tirkiyeyê hatiye kirin û li ser aqûbeta van kesan ti agahiyek nehatiye girtin. Jinên Êzidî yên li Serêkaniyê û Efrînê ji aliyê SMO'yê ve hatin destgîrkirin di bin kontrola rayedarên Tirk de neçar kirine ku bikin Îslam. Di nava Mijdara 2019'an û Tirmeha 2020'ê de li Serêkaniyê û Efrînê 49 jinên Êzidî ji aliyê hêzên SMO'yê ve hatine girtin.

DESTDIRÊJÎ Û DESTAVÊJIN JIN Û MÊRAN

Siberoja jinên Kurd ên li Efrîn û Serêkaniyê nediyar e. Ji ber tîrsa hêzên SMO yên di bin kontorla Tirkiyeyê de ne jin di malê de asê mane. Jin û zarokên keç ji aliyê vê hêzê ve tê destgîrkirin û destdirêjî û destavêjin wan. Dîsa li girtîgehên Efrînê tun-diya li ser jin û mêr hatiye belgkekirin. Hêzên SMO'yê mêrek neçar kirine ku şahiyê di destavêtina zarokêkê re bike. Bi girseyî destavêjin zarokan.

DI MEHEKÊ DE 30 JIN HATIN ZEWICANDIN’

Di meha Sibatê de destavêtin

30 jinan. Hêzên SMO yên di avêjin ser malan êrişên zayendî li ser jinan dikin, an jî dest davêjin wan. Yên vê dikin nayên cezakirin. Tûgaya Sûltam Mûrat jinên Kurd direvînin û neçarî zewacê dikin. Di meha Çileyê de endamekî vê Tûgayê jinek revandin û neçarî zewacê kirin. Mehek piştî jî ev jin berda.

MÎRASÊ ÇANDÎ TÊ TINEKIRIN

Li herêmên ku di bin kontrola dewleta Tirk û çeteyên wê de ne mirasê çandî tê tinekirin. hêzên SMO'yê li Efrînê gelke mirasê çandî û olî tine kirin. Li herêma Efrînê Qastel Jîndo, Qîbaar, Cindayrîs, Sharran û gelek goristan û merqebên Êzidiyan hatin dizîn û talanki-rin. Hemû binpêkirinên mafên mirovan û sûcên şer ên li Efrîn û Serêkaniyê bi vekirî binpêkirina mafên hiqûqa mirovî ya navneteweyî ne, dewleta Tirk ji van sûcan ber-pîrs in. Hêzên Tirk ji dizîna milkên sivîlan û bûyerên destdanîna ser haydar in, destgîrkirin û êşkencekirina sivîlan di bin kontrola rayedarên Tirk de pêk hatine. Rayedarên Tirk ên li pêiya vê nabin asteng, lixwegirtinên Tirkiyeyê bînpê kirine.” Komîsyonê diyar kir ku yên li Sûriyeyê hatine destgîrkirin û ji bo bîn dazendandin bi awayekî bê hiqûqî şandina Tirkiyeyê bibîr xist ku wê di çarçoveya sûcê şer de binirxîne û got: “Ev rewş dide nîşandan ku SMO û hêzên Tirkiyeyê di bin rêveberiyek û kontroleke ya hiyarerşî de ye. Sûcên şer ên van koman kirine, wê li ser bingehê ferman û navenda kontrolê bê nîrxandin.”



Mezlûm Ebdî, rapora komîteya lêpîrsînê ya serbixwe ya NY ya derbarê sûcên dagîrkeran yên li Efrîn û Serê Kaniyê de beşek ji sûcên şer bi nav kirin. *R-2*

NY, sûcên çeteyan kirin rapor

Rapora NY amade kirî balê dikişîne ser sûcên şer yên dewleta Tirk û çeteyên wê yên li Efrîn û Serê Kaniyê. Rapor diyar dike ku “Hêzên SMO bi îşkence û zorê dixwazin Kurdan ji herêmê derxin. Malên taybet yên gelek kesî hatin dizîn û talankirin. Malên bi zorê tîn desteserkirin û valakirin şervanên SMO yan jî malbatên wan dikevinê. Welatîyên Kurd bi sistematîk tîn Îşkencekirin..



Ji qebîleya Igêdat 125 kes tevli refên QSD’ê bûn

Piştî bûyerên fitneyê yên li gundewarê Dêreozêr ji bo pa-raştina ewleyiya herêmê, ji qebîleya Igêdat a li Dêrezorê 125 ciwan tevli refên Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) bûn. *R-2*



Îmarat û Israîlê bi awayekî fermî “Peymana Aştiyê” imze kirin



Li Koça Spî û bi beşdariya serokê DYA Donald Trump, Îmarat û Israîlê bi awayekî fermî “Peymana Aştiyê” imze kirin. *R-2*

Nûnera NY bi QSDê û Rêveberiya Xwe-ser re civiya



Nûnera taybet ya Kar û Barê Zaro-kan û Nakokiyên Çekdarî ya NY civîneke online bi Femandariya QSD’ê û Hevserokatiya Meclîsa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê re li dar xist. *R-4*

Li Kobanê di qezayekê de 4 karkeran jiyana xwe ji dest da



Li tesîseke çêkirina xîzê ya li kan-tona Kobanê ji ber şaşıyeke teknîkî teqîn çêbû. Di encama teqînê de 4 karkeran jiyana xwe ji deşt da û hin karkerên din jî birîndar bûn. *R-6*

Komeleya Newroz wargeheke manewî ya Kurdên li Lubnanê ye



Komeleya Newroz a Çandî û Civakî bûye wargeha Kurdan û bi taybetî ji bo jinên li Lubnanê. Komeleyê hişt ku gelê Kurdên li Lubnanê li dora hev kom bibin û ji aliyê manewî û rêxistinî ve bando-reke mezin li wan kir. *R-7*

Ji ewrên Venûsê nîşanên jiyane

Lêkolîneran li tebeqeya ewr a Venûsê hebûna gazeke ku girêdana wê bi jiyana li cihanê re heye tesbît kirin. Şefê NASA'yê jî têkildarî lêgerîna jiyane ya derveyî cihanê wek “bûyera herî girîng” pênase kir. Lêkolîn ji aliyê astronotekê ku li Zanîngeha Cardiff a Qiratiya Yekbûyî tê kirin ve tê birêvebirin. Li gorî lêkolîna li Kovara Natûre Astronomy hate weşandin, cara ewile ku li yek ji çar gerstêrkên cihanî ku di Sistema Rojê de yekbûyekî wiha keşif kiriye. Fosîla ku li ewrên Venûsê bi alîkariya radyoteleskopê hatiye çavdêrkirin.

Li gorî lêkolînê ev fosîl, ‘Di pêvajoyeke nayê zanîn a fotokîmya yan jî jeokîmyayê de, yan jî ji ber hebûna jiyane, mîna hilberînên fosîlên biyolojîk ên Cihanê dibe pêş ketibe.’ Ev yekbûyî li gerekstêrkên mezin ên mîna Satûrn ên xwedî gazên mezin ên di sistema Cihanê de cih digirin hene û koka wan ne biyolojîk in, yanî ji jiyana zindî nayên. Li pêşberî vê şopên fosîlan ên li ser bejahiya atmosferê de, ji xebatên mirovî û mîkrobiyen tîn. Midûrê NASA'yê Jîm Brîdenstîne got, “Gelo li Venûsê jiyana heye? Keşîfkirina fosîla

ku berhemeke ya biyolojîya anaerobîk, di lêgerîna jiyane ya ji derveyî cihanê heta roja îro bûyera herî girîng e.” Nexasim lêgerîna jiyane ya NASA'yê ya li derveyî cihanê li ser MARS'ê kûr bûye. Lêkolîner Jane Greave diyar kir ku şeweyê jiyane yê hebûnê ya li Venûsê ji bo bi rehetî li nava hewayê bigere diyar kir ku ‘pir biçûk e’. Zanyar Grae-ves destnîşan kir ku li gel vê, tesbîtîkirina fosîlê ya tenê bi serê xwe ne delîleke saxlem a hebûna jiyane ye, lê ‘kîmyayeke anormal û nehatî ragihandin e.’



Ebdî: Rapora komîteya lêpîrsînê ya serbixwe beşeke piçûk ya şerê taybet e



Mezlûm Ebdî, rapora komîteya lêpîrsînê ya serbixwe ya NY ya derbarê sûcên dagîrkeran yên li Efrîn û Serê Kaniyê de beşek ji sûcên şer bi nav kirin.

Fermandarê Giştî yê Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) Mezlûm Ebdî, têkildarî rapora NY ya derbarê sûcên dagîrkeran yên li Efrîn û Serê Kaniyê de daxuyanîyek li ser tîwittera xwe weşand. Daxuyanî wiha ye: “Rapora komîteya navneteweyî ya serbixwe beşeke piçûk ya

şerê taybet e. Yên komên çekdar ku bi nixumandina siyasî ya Tirkîyê li dijî gelê me yê li Efrîn û Serê Kanaiyê pêk tê. Divê civaka navneteweyî ji aliye sûcên şer dikin hesab bixawwe, bi cidiyet tev bigere û sûcdaran dadgeh bike. Têkildarî beşa girêdayî hêzên me: Paşguhkirineke bê sedem ji rastiya ku doza kampa Holê

bi girêk û xwedî bandoreke navdewletî heye. Piraniya 84 dewletan qebûlî nakin welatîyên xwe yên ji niştecihên kampê pêşwazî bikin. Rêxistîninê navneteweyî jî rola ya xwe ya alîkariyên mirovî kêm kirine. Em diyar dikin ku ku me derbarê rewşên ku di raporê de hatine parvekirin ku hêzên me sûcdar dike, dest bi lêpîrînê kiriyê.”

Şêniyên Heseke di merasima cenazeyê şehîd Umran de soza şopandina riya şehîdan dan

Bi hezaran şêniyên bajarê Heseke û gündên wê cenazeyê şervanê Hêzên Erkê Xweparastinê Umran El-Hamid li Goristana Şehîd Dijwar veşartin.

Welatiyan cenazeyê şehîd Umran El-Hamid ji ber avahiya Meclisa Malbatên Şehîdan a bajarê Heseke girt û bi karwanekî wesaitan ber bi Goristana Şehîd Dijwar ve ketin ser rê. Di merasima li goristanê de Hevserokê Meclisa Malbatên Şehîdan a bajarê Heseke Bedrî Hewale axivî û sersaxî ji malbatê re xwest.

Herwiha Bêrpirsê Têkiliyan ê Hêzên Erka Xweparastinê Salim İbrahim got, “Hêzên me wê gelê xwe biparêzin. Vîn û israra wan roj bi roj zêde dibe. Emê heta rizgarkirina tevahiya herêmên dagirkirî ji dewleta Tirk



û çeteyên wê têbikoşin.” Pişt re endama Meclisa Malbatên Şehîdan Rojda Ehmed wesîqeya şehadetê xwend û radestî malbata şehîd kir. Di merasimê de nasnameya

şehîd Dêrsim Ehmê (Qendîl) ê li çiyayên Kurdistanê şehîd bûyî hat eşkerekirin. Di dawîya merasimê de girse-ya gel cenazeyê şehîd di nava tilîliyan dayîkan de veşart.

“LI KEDA RÊBER APO XWEDÎ DERKEVIN”

Jiyan Bozo

Bi salan e Rêber APO di binê tecrîdeke giran û hovane de ye. Dewleta Tirk ya dagîrker nahêle parêzer û malbata wî biçin gel. Gelo li Îmralî çi dibe? Rewşa Rêber APO çi ye û ji bo şkandina tecrîdê divê çi bê kirin?

EM NE NOKA LI KEVIR IN EM XELEKA JI AGIR IN

Têkildarê mijarê endamê Meclisa Bajarê Amûdê Hemdî Esad, ji rojnameya me re wiha axivî: “Ev 21 sal in ku Rêber Abdulah Ocalan di girtîgeha dewleta Tirk ya dagîrker de ye. Li girava Îmralî di binê tecrîdeke giran û hovane de ye. Mebesta wan tînekirina rêbertiya me û qutkirina wî jî gel e. Rêber APO afrînerê jiyana azad û birûmet e. Ti kes û ti hêz nikarin roja me tarî bikin. Bi van êrişan dixwazin vîna me bişkinin, lê em ne Kurdên berê ne, em



“Rêber APO hebûn û nasname-ya me ye. Armanca dewleta Tirk ji tecrîdê tinekirina azadî û vîna me ye. Rêber APO ne rêberê gelê Kurd tenê ye, xwediye projeya Neteweya demokratîk û afrînerê jiyana azad û hevbeş li Kurdistan û Rojhilat Navî tevê ye. Azadiya Rêber APO azadiya me jinan e. Em xwediye vî ve şoreşê ne û deyndarên rêbertiya xwe ne. Heta em ve tecrîdê bişkinin emê li ser piyan bin û tekoşîna xwe xurttir bikin. Li ser vî bîngê bî banga min ji jinan tevan re heye. Rêber APO em azad, bîrade û xwedîmaf kirin. Divê em jî li keda wî xwedî derkevin, tecrîdê bişkinin û rêbertiya xwe azad bikin.”

LI KEDA RÊBER APO XWEDÎ DERKEVIN

Endama Meclisa Kongreya Star ya bajarê Amûdê Mira Zoro jî ji rojnameya me re wiha axivî:

Îmarat û Israîlê bi awayekî fermî “Peymana Aştiyê” imze kirin

Li Koça Spî û bi beşdariya serokê DYA Donald Trump, Îmarat û Israîlê bi awayekî fermî “Peymana Aştiyê” imze kirin.

Ji aliye Îmaretê ve, wezîrê derve Şêx Ebdullah Bin Zayid El Nehyan û ji aliye Israîlê ve serokwezîrê wê Benjamin Netan-yahu peyman imze kirin. Herwiha wezîrê derve yê Behreynê Ebdulatif El-Zeyanî peyamana ragihandina piştigiriya aştîyê bi Israîlê re imze kir. Imezekirina peymana aştîyê li parka başûrê Koşka Spî bi beşdariya 700 mêvanê jî welatên cîhanê pêk hat. Trump got “Ji bo guhertina herkîna dirokê em li vir in. Bi



saya van her sê welatan em gaweke dirokî diavejîn da aştî û pêşketin xurt bibe.” Trump diyar kir ku wê “Israîl, Îmarat û Behreyn sefaretan veguhêzin û bi awayekî xurt bibin hevkar û di qadên weke tûrîzm, bazirganî, tenduristî û ewleyiyê de koordine bikin.” Herwiha got, ew gav wê derî ji misilmanên cîhanê re veke ku serdana Mescid El-Eqsa û Israîlê bikin.

Ji qebîleya Igêdat 125 kes tevî refên QSD’ê bûn



Piştî bûyerên fitneyê yên li gundewarê Dêrezorê jî bo paras-tina ewleyiya herêmê, ji qebîleya Igêdat a li Dêrezorê 125 ci-wan tevî refên Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) bûn.

Ciwanên tevî QSD’ê bûyin wê 45 rojan perwedeya siyasî, fikirî û leşkerî û bikaranîna çekan bibînin. Li gorî fermandariya leşkerî ya Akademîya Şehîd Egîd a Dêrezorê “Piştî bûyerên li gundewarê Dêrezorê weke şêx Metreş El-Hefel û hewldanên derxistina fitneyê ji aliye rejîma Sûriyê û Tirkîyê ve, ciwanên qebîleya Igêdat xwestin paras-

tina ewleyiya herêmê xurt bikin û li hemberî terorîst û kesên ku hewl didin aramiya herêmê xerab bikin bisekinin.” Eîl El-Celûd ê jî qebîleya Igêdat got, piştî zêdebûna bûyerên kuştina sîmbolên herêmê, bir-yar daya ku tevî Hêzên Sûriya Demokratîk bibe. Umer Ebdullah El-Cerwan û Mûsa Xelef jî heman tişt gotin û diyar kirin ku ji bo parastina ew-leyiya herêmê wê bibin mertal û destkeftiyên şehîdan biparêzin. Piraniya ciwanên tevî QSD’ê bûyin ji bajarokê Şihêl yê gundewarê rojhilatê Dêrezorê ne.

Komeleya Newroz wargeheke manewî ya Kurdên li Lubnanê ye

Komeleya Newroz a Çandî û Civakî bûye wargeha Kurdan û bi taybetî ji bo jinên li Lubnanê. Komeleyê hişt ku gelê Kurdên li Lubnanê li dora hev kom bibin û ji aliye manewî û rêxistinî ve bandoreke mezin li wan kir.

Roja Çarşemê salvegera 6an ya vekirina Komeleya Newroz a Çandî û Civakî ya Kurdên Lubnanê bû. Komeleya Newroz 2’yê Îlona 2014’an li paytexta Lubnan Beyrûdê hatibû da-mezrandin û bi awayekî fermî 16’ê Îlona heman salê hatibû vekirin.

Komele girîngiyê dide çalakiyên Kurdan û aktivîteyên ku wan bi rêxistin dike, li dar dixe. Herwiha awmanca wê lidarxistina çalakiyên civakî, tenduristî, projeyên çandî û perwerdeyê, pêşxistina behreyên hunerî û folklorê Kurdî, zanakirin û perwerdekirina jinan ji aliye civakî, siyasî û çandî ve, fêrkirina zimanê kurdî û nasandina nasnameya kurdî ye.

Komele ji komîteyên gel, jin, ciwan, çand û huner, zimanê kurdî û komîteya xwendekarên zanîngehê pêk tê. Seroka Komeleya Newroz a Kurdên li Lubnanê Henan Osman wiha got: “Ji ber vala-riya li Lubnanê bi giştî, pêwîstî

bi rêxistinkirina ciwan û jinan hebû.”

‘KOMELEYA NEWROZ LÊVEGERA GEL Û JINAN E’ Komîteya Jinan yek ji komîteyên herî aktîf ên komeleyê ye. Komeleya Newroz li ser asta Lubnanê bi “Ko-meleya Jinên Kurd” tê nasîn. Lewre piraniya endamên wê jin in û bi awayekî aktîf tir jin kar dikin.

Komeleya Newroz jî bo gihîştina her Kurdekî li Lubnanê û Rojava û bo rêxistinkirina wan, gavên mezin avêtin. Komele bûye wargeh û lêvegera hemû gelê Kurd û bi taybetî jinan û ji aliye manewî ve bandoreke mezin li wan kiriyê.

Komele hewl dide pîrsgirêkên malbatî û civakî çareser bike û xwe li hemberî wan pîrsgirêkan berrisyar dibîne. Komeleya Newroz bêhtir li ser mijarên tundiya li dijî jinan, zewicandina bi temenê biçûk û pîrsgirêkên malbatî disekine û hewl dide



gel li ser tundiyê, mafên wan, xweparastinê, jin û siyaseta, dozên civakî, rewşa siyasî ya niha li Lubnanê û perwerdekirina baş , perwerde bike û nîqaşan bimeşîne. Her wiha komeleyê piştigiri-ya şoreşa Rojava û Bakur û Rojhilatê Sûriyê, nexasim piştigiriya Berxwedana Serdemê ya Efrînê (2018) kir û şande-yeke piştevanan şand Efrînê. Şande bû pira di navbera jinên Lubnanê û jinên Rojava de û ji tecrubeyên hev sûd girtin. Henan Osman wiha dibêje:

“Têkoşîna jinên Kurd li hemû parçeyên Kurdistanê (Rojhilat, Rojava, Bakur, Başûr) wekî çalakîyên Kurd Zeyneb Celalyan di girtîgehên Îranê de, Leyla Guven, berxwedana fedayî ya Arîr Mîrkan di şoreşa Rojava (Şoreşa Jinan) de, bandoreke mezin li gelê Lubnanê bi giştî û jinên Lubnanî bi taybetî kir. Her wiha derfet da me ku em xwe di civaka Lubnanê de îspat bikin, bi vê nasnameyê em bihêztir bûn û me deriyên têkiliyên bi rêxistin û tevgerên jinan ên Lubnanê re, vekir.”

‘Bi ruhê berxwedana Kobanê em berxwedana Heftenînê silav dikin’

Li Kobanê bi pêmana salvege- ra berxwedana li dijî çeteyên DAİŞ’ê, çalakiyeke hunerî bi durîşma ‘Bi ruhê berxwedana Kobanê em berxwedana Heftenînê silav dikin’, hat lidar-xistin. Çalakî ji aliye Tevergera Mezo-potamyâ ya Çand û Hunera

Demokratîk û Tevergera Kevana Zêrîn ve hat lidarxistin. Gelek komên mûzîk, stiran û şano yên gelên herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê beşdarî çalakiyê bûn. Axaftina destpêkê ya çalakiyê ji aliye hevserokê Meclisa Malbatên Şehîdan a Kantona

Kobanê Arif Balî ve hat kirin. Balî got, “Berxwedana li Kobanê hatî kirin li Heftenînê li hemberî herîman zîhniyetê di lûtkeyê de ye.” Balî banga berx-wedana li hemberî dagîrkeriyê li gelê Kurd kir. Piştî axaftinan, Koma Botan, Koma Hevrîn û komên girêdayî



navenda çand û hunerê ya Baqî Xido ya Kobanê stiran gotin Hunermenên Kurd û Erebe, Sîpan Xelat, Baran Gulbuhar û Firas lweyîd stiranandin. Çalakî bi stiranên neteweyî û folklorî bi dawî bû.

Li Holê çalakiyeke hunerî ya helbestan li dar ket

Ji bo vejandina çanda Erebi û belavkirina helbesta gelêrî, Komîteya Çand û Hunerê ya kantona Heseke bi durîşma “Kultur Neynika Çand û Şaristaniyê ye” çalakiyeke hunerî li navçeya Holê li dar

xist. Çalakî di binê konekî de li berava gola Xatûniyê ya li navçeyê bi tevîçbûna bi dehan welatiyan û endamên sazîyên sîvîl û leşkerî û helbestvanan li dar ket. Piştî deqeya rêzgirtinê, Ber-devka Komîteya Çand û Hunerê ya kantona Heseke Efaf Hesekî axivî û got, “Ev

çalakî kultur û çanda erebî vedijîne. Fikir û rêgeza netewe-ya demokratîk û biratiya gelan di pêkanîna armancên gelên Sûriyê di azadî û demokrasîyê de rolê dilîze. Pişt re gelek helbest ji hêla hel-bestvan Hemîd Receb ê jî nav-çeya Holê, helbestvan Sacîde Hesen û gelek helbestvanên din ve hatine xwendin. Navaro-



ka helbestan girêdayî biratiya gelan, neteweya demokratîk û dagîrkirina dewleta Tirk bajarên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bû. Di dawîya çalakiyê de beşdaran xelekên govendê li ber stranên hunermend Silêman El-Camûs yên gelêrî yên erebî gerandin.



Mentalîta Civakê û Guherîna Mejî 2

Sîpan ŞÎNDA

Di nivîsa heftiya bûrî de me hinekî qala mentalîta civakê kiribû. Mentalîte li gorî civakan tê guhertin. Di nav civakan de ji li gorî dema tê guhertin. Dema mirov li dirokê dinêre, mirov dibîne ku di hinek deman de di nava hinek civakan de mentalîteyên gelekî hişk derketi-ne pêş. Yek ji van mentalîteyên ku gelekî hişk di çaxê navîn de derketi-ye pêş mentalîteya felsefa skolaştîk e. Evê mentalîteya hişk, demekî dirêj civakên Ewropî êxsiir girtiye. Ev mentalîteyên ku him îqtîdar lê xweyî derketî û him jî ol lê xweyî derketî, ji bû guherîna mejî ji bûne asîngiyên mezin. Jiber ku kesên li dijî van mentalîteyan derketin û derdikevin bi awayekî dijwar raştî berteke hişk hatine û îro jî tene. Mixabin her çend dem tèn guher-tin û civak jî tene guhertin lê her civakekî li gorî dema xwe ji xwe re mentalîteyekê datîne. Her çend di roja me de cihan gelekî pêşketiye jî, lê belê mirov di nava civakan hê jî tiştên xerîb dibîne. Di nava pîr civakan de heqaret, lêdan, xeber û kêsxwere kirina jinê îro jî tê erê kirin. Dema mîrek zileheke yan ji darekê li jina xwe bide, yan ji xeber û kêsxwera bike jina xwe û ew ji dengê xwe derbixe, te dît mirov, cîran û gelek kesên din dibêjin “deka mîrê te ye xem nake, hema darek ji li te da ma çi biye”. Ango ewê rewşa dibînin û dixwazin ew jin jî wê bipejirine. Disa mentalîteya perwerdehiyê hetanî îro jî di nava gelek civakan de li ser bîngêhê lêdan û çavtirsandina zarokan hatiye avakirin. Ev mentalîte bi sed salan e di nava pergala perwerdehiya olî de ji heye û herweha di nava per-gala dibîştanan de jî heye. Zarok ne li ser bîngêhê hezkirinê û dan hezkirina xwendinê tèn perwedeki-rin, lê li ser bîngêhê darê tîrsê tene perwerdekirin. Ev mentalîte ne tenê lêdan e, herweha çavtirsandina ji dibîştanê hatin avêtin, pileyê kêm şandin, li cem dê û baban gilîkirin û hvd. Heta niha jî di nava hinek civakan de jin nikarin siwarê bajon yan ji karên jîderve bikin. Jiber ku mentalîte rê nade wan. Eql û mejiyê mentalîteyan piştî demekê zeng digire, kor dibe. Hingî dibe hişkîrî dibe, xedartir dibe. Bi taybetî ji di nava civakên gerdîşperest de mirov dikare wê yekê bi awayekî eşkeretir bibîne. Di roja me de, girêdayî bandora teknolojîyê mentalîte jî zûtir tene guhertin. Jiber ku teknolojî derfetî dide mirovan ku li kûdera cîhanê bin bila bibin, ji pêjveçûnên di nava gerdûnê de zûtir agahdar bibin. Ev jî derfetê dide mirovî ku mirov di nava gîyanê xwe de, di nava mejiyê xwe de bikaribe hinekî rihettir guhertinan çêbîke. Ango mirov dikare bi awayekî rihettir li himberî pêşûriyên mentalîteyan derbîke-ve û serî li himber hilde. Herweha mentalîte jî neçar dimînin ku li gorî demê xwe biguherînin. Jiber ku heke mentalîteyê di roja me de xwe ne-guhere û nîjen neke, wê di demekî kin de jî halê rabe.

Li Kobanê di qezayekê de 4 karkeran jiyana xwe ji dest da

Li tesîseke çêkirina xîzê ya li kantona Kobanê ji ber şasiye-ke teknîkî teqîn çêbû. Di encama teqînê de 4 karkeran jiyana xwe ji dest da û hin karkerên din jî birîndar bûn.

Roja Pêncşemê li kana Cizîrê ya li gundê Hemdon a başûrê rojhilatê Kobanê teqînek çêbû. Di encama şasiyeke teknîkî ya danîna madeyên teqemeniyê li kanê de, 4 karkeran jiyana xwe ji dest da û 4 jî birîndar bûn. Birîndar birin nexweşxaneyên Minbicê, Cenazeyên karke- ran veguhestin nexweşxaney a Kobanê û navên 3 ji wan wiha ne: Mihemed Arif (40), kurê wî Xelîf Arif (12) ji gundê Metîna,



kurê xwediyê kanê Abdullah Narko ji gundê Çêlikê. Çavdêrên li ser kanê bi awayekî

dorveger her roja Pêncşemê madeyên teqemeniyê bi kar tînin da xîzê çêkin.

Şaredariyên gel projeyên xizmetgûzariyê didomînin

Şaredariya Gel a bajarokê Xeranic yê gundewarên rojhilatê Dêrezorê bi piştgiyariya Komîteya Rêveberiyên Herêmî û Şaredari-yan ên Meclisa Sîvil a Dêrezorê karê sererastkirina riyên di navbe- ra gund û bajarokên gundewarên rojhilatê Dêrezorê de didomîne û wê heta rîya giştî ya Dêrezor-Reqayê bidomîne. Piştî sererastkirina rîya Ebû He- mam heta Hecîn û Behrayê, dest bi riyên bajarokê Xeranic heta bi bajarokê Teyanê kir. Dirêjahiya rê li derdora 40 km ye. Hevserokê Şaredariyê Siûd Mihemed da zanin ku berî niha Şaredariya Xeranic karên sere- rastkirina kanalizasyonên rîya giştî bi dawî kirin. Herwiha Mihemed

spasiya Komîteya Rêveberiya Herêmî û Şaredariyan ji bo piştgi-riya sererastkirina riyên li rojhilatê Dêrezorê kir. Şaredariya Gel a bajarokê Hel- wa ya navçey a Tirbespiyê ji jî ber vîrûsa Koronayê xebata xwe rawestandibû û niha dest bi kar kir. Hevserokê Şaredariya Gel a bajarokê Helwa Salih Hisên diyar kir ku li gundê Til Şêir, Beyandor û gundê Helwa Şêx bi dirêjahiya 2 km dest bi projeya kanalizasyonê kirine û lêçûna wê li derdora 35 milyon lîreyên Sûriyê ye. Li herêma Efrînê jî Desteya Şaredariyan karê xwe didomîne. Ji karên meha borî hatin kirin, reşandina derman û dezenfekte-



kirina rîyan û qadên giştî. Herwiha reşandina Klorê li cihên gelaş û kanalizasyonan. Li gundê Kefer Naya yê kantona Şehba ji 3 jenerator hatin danin. Bi vî awayî ji sedî 95 kantona Şehbayê hat ronîkirin. Li gel vê torên kehrebayê û gelek jenerato- r hatin sererastkirin û alavên hinan hatin guhartin û jenerato- rên 6 wesayitên giran û erebeyan hatin sererastkirin.

Heta niha 262 hezar û 169 lître mazot li şênîyên taxa şêxmeqsûd hatiye belavkirin

Meclisa Giştî ya taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê nêzî mehekê ye mazot radestî Komîteya Xizmetgûzarî ya meclisê taxê beşên rojhilat û rojavayê taxa Şêxmeqsûd kiriye da li welatiyan were belavkirin. Meclisa Giştî 100 lître ma- zot bi bihayê 19 hezar lîreyên Sûriyê diyar kir. Li ser vî bingeht Komîteya Xizmetgûzarî bi çavdêriya komînan mazotê li welatiyan belav dike. Komîteyê heta niha 262 hezar û 169 lître mazon li şênîyên taxê belav kiriye. Têkildarî mijarê Hevseroka Mec- lisa Giştî ya taxa Şêxmeqsûd



û Eşrefiyê Velantîna Ebd o got komîteyên t êkildar mazotê berî destpêkirina zivistanê li welati-yan belav dikin. Velantîna diyar kir ku xebat belavkirinê li gorî hatş diyarkirin didome. Belavkirin wê di deme-ke nêz de li taxa Eşrefiye dest pê bike. Herwiha meclis wê hewl bide di demên pêş de beşeke din a mazotê belav bike.

Piştî 10 salan cara yekê ye pembû û kunciy an diçin in

Piştî 10 salan, di encama peydabûna avê ji bendava başûrê Hesekekê de, pembû û kuncî ji nû ve li navçeya Şedadê derdikevin. Ji ber dijîmîniya dewleta Tirk a dagîrker, kêmbûna baranê û çeteyên DAIŞ'ê li herêmên başûrê kantona Hesekekê, ava çemê Xabûrê salên borî kê m bû û çandîna pembû û kuncî-yan rawestiya. Lêbelê piştî peydabûna avê ji depoya bendava başûrê Hesekekê gelek cotkaran dest bi çandîna kungî û pembû kir. Endama rêveber a Komîteya Çandîniyê ya navçeya Şedadê Beraa Xelîf diyar kir ku rûbera zeviye n pembû û kunciy an nêzî 8 hezar û 300 donimî li



seranserê çemê Xabûr e. Her- wiha jê 3 hezar û 500 donim kuncî û 4 hezar û 800 donim pembû ye. Beraa Xelîf da zanin ku piştgi-riya cotkaran a îsal bi peyda- kirina sotemenî û semadê bi bihayekî guncaw bû.

Konferansa 3. ya Kongreya Star ya kantona Efrînê bi dawî bû

Konferansa 3. ya Kongreya Star ya kantona Efrînê bi hîlbijarti- na 21 endamên koordînasyonê û meclisa kongreyê bi dawî bû.

Konferansa 3. ya Kongreya Star ya kantona Efrînê bi durîşma `Bi t êkoşîna Hevrîn û Zehrayan wê dagîrkerî bi dawî bibe û serkef- tîna şoreşa jinan mîsoger bikin` li Şehbayê pêk hat. 160 delge beşdarî konfernasê bûn. Di konferansê de hevseroka PYD'ê Eyşe Hiso rewşa siyasî nîrxand. Eyşe Hiso di destpêka nîr- xandîna xwe de bal kişand ser hewldanên t êkîbirina pro- jeya Rêveberiya Xweseriya

Demokratîk û got, “Me xeta sisiyan hîlbijart, me gelek ser- keftin bi dest xistin. Em dibînin ku projeya Rêveberiya Xweserî- ya Demokratî dikare xwe di her qadî nîşan bide û destkeftiyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê biparêze.” Eyşe Hiso bal kişand ser aloziya Sûriyê û zêdebûna nakokiyên hundir a ji ber mudaxeleyên derve û wiha axivî: “Civînen li Astana û Cînev çêbûyîn b êncam bûn.”

Hevseroka PYD'ê Eyşe Hiso, di dawîya axaftina xwe de bang li partiye n siyasî kir ku li hemberî zêdegaviyên dewleta Tirk a dagîrker, bi taybetî ên li dij jinan helwesta xwe diyar bikin, her wiha bang li jinan kir ku li hemberî êrişên dagîrkeriya Tirk bisekinin û xwe bi rêxistin bikin. Di konferansê de Şîrîn Behrî, Eyşe Mehmûd, Ferîda Îbo û Fatîma Silêman ji bo endamtiya Koordînasyona Kongreya Star a Kantona Efrînê û 21 endamên



meclisa Kongreya Star a kanto- na Efrînê hatin hîlbijartin. Konferans bi axaftina endama Desteya Rêveber a PYD'ê Hedi-

ya Yûsif bi dawî bû. Hediya Yûsif konfernas li tevayîya jinan pîroz kir.

Jinên ciwan li herêma Cizîrê şideta li ser zarok û jinan şermezar kirin



Bi sedan jinên ciwan ên bajarê Hesekekê û Qamişlo ji bo şerme- zarkirina şideta li ser zarok û jinan bi durîşma `Na ji şidet û dagîrkeriya Tirk re` meşîyan û banga azadiya rêber Abdullah Ocalan kirin. Teygera Jinên Ciwan ên bajarê Qamişlo û Hesekekê li herêma Cizîrê ji bo şerm ezarkirina s ûcên

dewleta Tirk ên li hemberîzarok û jinan li herêmên dagîrkirî û azadiya rêber Abdullah Ocalan 2 meşê organîze kirin. **QAMIŞLO** Meşa Qamişlo ji Çerxeriya Şehîd Rûbar dest pê kir. Bi dehan endamên jin ên saziyên sîvil û leşkerî û şênîyên bajarê Qamişlo tev li meşê bûn. Meş li ber avayîya Neteweyên Yekbûyî qediya. Li wir jîna ciwan bi navê Tolîn Reşîd daxuyanî xwend û b êdengîya rêxistin an mafên zarok û jinan li hemberî s ûcên dewleta Tirk ên li Efrînê û herêmên dagîrkirî şermezar kirin.

HESEKÊ Bi sedan ciwan û jinên ciwan û şênîyên bajêr tev li meşa Hesekekê bûn. Meşê ji ber çerxeriya şehîd Ser- hed a li taxa Miftî dest pê kir û li ber Komeleya Mafên Zarokan a li taxê bi dawî bû. Di mitînga piştî meşê de enda- ma rêveberiya Yekîtiya Jinên Ciwan Rosîm Mihemed Hisên daxuyanî xwend û s ûcên li dijî zarokan yê n li herêmên dewleta Tirk dagîr kirin, şermezar kirin. Di dawîya daxuyanîyê de bang li ciwanan hat kirin ku li hemberî êrişkeran li ber xwe bidin.

Di xebata yekîtiya kurdî de jin xwedîrol in



Hediya HİSÊN/Ronahî Qamişlo

Ji bo çareseriya aloziya li Sûriyê yekîtiya Kurdên Rojava pir girîng e. Ji bo wê Fermandarê giştî yê QSDê Mezlûm Ebdî dest bi însiyatîfêkê kir û ji bo yekîtiyê bangî hêzên kurdî kir. Derbarê mijarê de enda- ma Meclisa PYDê ya giştî Erîfa Bekir ji rojnameya me re ev nîrxandin kir: “Ji ber şer û pevçûnên berî deh salan li Sûriyê dest pê kirîn û çaresernekirina aloziyê, gelek dewlet ketin navberê û xwestin welat dagîr bi- kin. Ji bo çareseriya vê aloziyê pêwîstî bi yekîtiya kurdî heye. Ji bo wê me Encûmena PYDê pêşwaziya vê însiyatîfê kir û bi ENKS re gelek civîn çêkirin. Qonaxa yekê bi serkeftî qediya. Di qonaxa duduyan de peyman a siyasî û ava- kirina maleke neteweyî ya kurdî ku li seranserê cîhanê nûnerîtiya Kurdan bike, heye. Di vê xebata yekîtiyê de rola jinan heye. Beşdarî civînan dibin û rola wan

xurt e. Çimkî di vî şerî de yê n herî zêde êş kişandî jin bûn. Yê n zarok, hevjin û birayê n xwe wînda kirîn jin bûn. Yê n bûyîn şahidên gelek bûyerên biêş jin bûn. Ji ber wê ji her kesî pirtir xwestin yekîtiya kurdî çêbe û ev alozî biqede.” Erîfa Bekir axaftîna xwe wiha qedand: “Ez koçbe- reke ji Efrîna dagîrkirî me û endama meclisa PYDê me. Ez bang li jinên partiye n din dikim ku ji bo serkeftîna vê xebatê hewl bidin û dawiyê li nakokiyên navxweyî binin.” Hevseroka Desteya Çandê ya Herêma Cizîrê Rewda Hesen ji jî rojnameya me re wiha axivî: “Ji dîrokê heta niha jîna Kurd li her qadê roleke girîng listiye. Bi taybetî di şoreşa Rojava de di her qadê de pêşengî kir. Armaca wê her tim pêkanîna wekhevî û aşti ye. Îro jî beşek ji beşdarên yekîtiya kurdî ye. Em bi hevî ne ku ev yekîtiî zû pêk were.”

hamleya KCKê, felsefeya azadiyê ye !..

Medeni FERHO



Sadakat û degelî-cesaret îrade û hişmendî, ahlak û fedekarî, destûbirakên azadiyê ne!... Zexelî û bêziravî, berjewendî û tiralî, dirûtî û bêbextî, destûbarkên koletiyê ne!... Her dû basik jî, di tevgerên civakî de role dîlîzin, yek erênî ye, ya din jî neyînî ye!... Lê em, xala duyemîn di nava me- toda diyalektîkê de bi cih nakin, ji ber ku ev karektir, ji bo gelê xwe naçê ber sêdarê, ji teorî û felsefê dûr e, zembereka saeta bedena civakê jî li gorî berjewendiye n xwe ayar dike. Di literature romanê de, navê kesên di baskê duyemîn de: Karakterê bê karakter in. Ev tipoloji, tîrsonek-bêzirav in, tîrs jî, ahlak û sadakatê t êk dibe. Ev tipoloji, wek lehengê romana Ca- mus “weba”, û tipolojiyê ku Satre bi tîrsa mirinê bi nav dikê ne. Ji dînamîzma tipolojiya Nietzsche

dûr in!... Ev tipoloji di nava Kurdan de jî hene û dixwazin pêşengîya gelê Kurd bikin; mixabin ev kesên xwe pêşeng û lider dibînin, ji kolektivîzma ku Satre behsa wê dike dûr in!.. Li gorî literature Kurdî, tovê waweyê ne, korik û pûç in, berheman nadin!.. Binêrin, li Tirkiyê civak bi giştî ji huner û felsefê hatiye dûr kirin; êdî bi “şerbata şehadet” a ku di serê tîpîk-nexweşên dewşirmeyên wek “mankut” an dihatin terbiye û edeb kirin de derxistîne holê. Em, behsa “formula tîlsimî” ku, t ê xweştin li Başûrê Kurdistanê bela bikin nakin û derbas dibin... Lê em dibînin ku “aql-i selîm”î, “dilsozî” li Başûr, tenê bi gel re heye. Gelê Kurd di meşek demê de ye, dîroka alternatîf dinivîse. Ev meşa mezin û dîrokî, lêgerîna edalet, demokrasi, azadî, aşitî, biratî, hevreyî û wekhevîyê ye!...

Di vê meşê de, qerebalix û wel- weleya dîroka netewew-dewletan wek keliha ji qumê diherive. Lewma faşîzma sedsalê ya Turk-î îslam, bi hemû hêza xwe êriş dike, sucên şer û mirovaniyê dike; Ew- ropa ku, bi dîroka xwedî derketina li demokrasi û mafên mirovan, bi dîroka xwedî derketina li şariştanî, heq, hiqûq û mafên mirovan pesnê xwe dide, b êdeng e!... Me got, hamleya KCKê felsefeya azadiyê ye û ji bo vê jî seferberî- yek dive!... Slogana hamleya KCKê; “Em dawî li tecridê, li faşîzmê û dagîrkeriyê binin, dem dema pêkanîna azadiyê ye”!.. Gurzê sedsalê ye û dive faşîzma sedsalê were mahkumki- rin. Bi gotîna Shakesperar: “Ji bo aştiya ku hinekî tîrsiya ye, were ser hişê xwe/ Devê vê axa ku, ji b ê aviyê zuwa bûye/ Edî, l êvên xwe bi xwîna zarokên xwe şil nake/ Sîperên şer, zeviye n wan bi cökên kûr xera nakin/ Hespên dijîmin, ji îro û pê de, wê nikarî- bin pêlê bikin/ Gulbijêrkên delal, çavên delal ku li hev dinêrin” nika- rin tune bikin.

Hamleya KCKe, dermanê êşa hev- par ya gel Kurd e. Eşa hevpar ya gelê Kurd, faşîzm e, tecrid e, dagîrkerî û qirkirin e, lewma felsefeyek e û wek banga serferbiya giştî ye!... KCKe, bi vê hamleyê, wek La Fontaine dibêje “Mîrov ew e ku hej jê kirina xwe dibêje ye”, banga hej jêkirinê dike, hej jê kirina Kurdan jî, pêkanîna yekîtiya neteweyî ye, t êkoşîna hevpar ya li dijî faşîzm û dagîrkeriyê ye. El heq; Kurdîstaniyê n li çar aliye n cîhanê, bersivên erênî dane banga KCKê. Li Ewropa 48 sazi, parti û rêxistinên civakî bi yek devî bersiva erênî dane hamleya KCKê. Di ser- ketîna hamleya KCKê de, destêka Kurdîstaniyê n li Ewropa girîng e. KCKe bi vê hamleyê dixwaze, zîhniyeta dijîmin ku “kurdên xe- rab” û “Kurdên baş” derdixe pêş û qîkîrinê dike ji hole rake. Dewleta Tirk, îro “kurdên xerab” tune dike, sibe, wê “kurdên baş” tune bike. Dîrok neynik e! Hamleya KCKê, hinekî li dijî siyaseta bi “maske” ya Ewropa de; Ewropa, dixwaze “yekîtiyên sexte” di nava Kurdan de ava bike; eger yekîtiyek çêbibe pêwîste hemû

Kurd, PKK, PDK, YNK, Goran, PYDe û hemû partiye n din yê n Kurdan jî di nava wê yekîtiyê de cih bigirin. Ji bilî vê, hemû yekîtiî “Yaseya Gresham” in; Ev yasa, xeraban ser- deşt dike û başan berteref dike. Cih girtîna di serdema me de “zor zenaat e”; PKKe, çil sal in vê “zor zenaetê” dike û raştî gelek pêxemberên îhanetê hatiye. Tecrida li Imraliyê, îxaneta navneteweyî ye û pêxemberên wê jî diyar in!... Tecrid, wek sistemekê tevahiya Tirkiyê dagîrkirîye, kirîye Erdoganiştan. Dema Enwer Paşa jî, Elmanan digot; “Enwerland”!... Ege- doganland, îro deşt avêtiya Başûrê Kurdistanê û tekelîştanek li wir jî ava kiriye. Tekeliştanî, lalî ye koritî ye, kerritî ye, felcbûn e, tûnebûn e!... Hamleya KCKê, pêşî paraştina destkeftiyên gelê Kurd yê n li Başûr e, paraştîna destkeftiyên gelê Kurd yê n li Rojava ye!... Ez cûmle: Xwedî derketina li erd, nîrx û deştke tiyan, t ê wateya “fel- sefeya azadiyê”, hamleya KCKê jî ev xwedî derketin e û deştêk kirin, deynê hemû Kurdîstaniyan e!...

Ji HPC-Jin biryarên girîng

Konferansa Yekê ya HPC-Jin ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi biryarên girîng t êkildarî rêxistina jinan di qada parastina civakî de bi dawî bû. Konferansê roja Sêşemê dest pê kir. Tê de rapora sa- lane hat xwendin û nîqaşkirin û rêzîknameya HPC-Jin hat şîrovekirin.

Piştî nîqaşan, konfernas bi girti- na biryaran bi dawî bû. Çend ji biryaran wiha ne: -Akademiyeke taybet ji bo jinan were vekirin. -Dewreyên perwerdeyê di warê parastina civakî de werin birêxistinkirin. -Li herêman tevan dibistanên karate û tekwando werin vekî-



rin. -Li her herêmê navendên paras- tîna rew a yê n sîvil werin vekirin. -Komîteyên parastîna civakî di meclisê n jinan de werin avakirin.

Tenduristiya Mûckan Kawisî ya li girtîgeha Îranê xerab e

Piştî 16 rojan ji greva birçîbûnê, tenduristiya siya- setmedar, nivîskar û lêkolînera Kurd Mûckan Kawisî ya ji Rojhilatê Kurdistanê xerab bû û ji bo dermankirinê birin nexweşxaneyê. Siyasetmedar û lêkolînera Kurd Mûckan Kawisî ku li girtîgeha Êvîn t ê girtin, li dijî kiryarên

rêveberiya girtîgehê jî 1`ê Îlonê ve dest bi greva birçîbûnê kiribû. Piştî çend rojan ji greva birçîbûnê û b ê ku rêveberiya girtîgehê guh bide daxwaziye n wê, rewşa Mûckan xerabtir bû û greva birçîbûnê domand. Li gorî malpera “Herana” ya mafên mirovan a Îranê, piştî ku xerabbûna tenduristi-

ya siyasetmedara Kurd birin nexweşxaneyê. Siyasetmedar û lêkolînera Kurd Mûckan Kawisî 22`yê Gulana 2020` an hatibû girtin û biribûn girtîgeha Nûşher a navendî. 22`yê Tîrmeha borî biribûn beşa jinan y girtîgeha Êvîn a li Tehranê



Berdevkê Polîtîkaya Derve ya Swêdê: Emê derxistina PKK'ê ji lîsteyê bixin rojevê

Parlamentêrê Partiya Çep ya Swêdê û Berdevkê Polîtîkaya Derve Håkan Svennelig da zanîn ku piştî girtina doza kuştina Serokwezîr Olof Palme, wê mijara derxistina PKK'ê ji lîsteya rêxistinên terorê bixin rojeva Swêdê û Yekîtiya Ewropa.

Berdevkê Polîtîkaya Derve ya Partiya Çep Håkan Svennelig û Ahmet Ülösoy ku ji ber kuştina Palme bi salane bû mexdûrê zextên dewleta Swêdê, ji ANF'ê re axivîn. Svennelig bîr xist ku di lêpirsina

kuştina Palme de kesên bi kuştinê dihatin sûcdarkirin gelek caran hatin guhertin, rayedar bi pey şopa şaş ketin, giranî dan kes û komên şaş û îdlaya sûcdarkirina PKK'ê mînak nîşan da.

Svennelig diyar kir ku wê di dema herî guncaw de mijara derxistina navê PKK'ê ji lîsteya rêxistinên terorîst bixin rojeva Parlamenta Swêdê û got, emê vê mijarê teqez binîrxînin û emê bixin rojeva Yekîtiya Ewropayê jî."



Hikmet Hebîb: Em li benda encamên hevdîtinên bi rayedarên Rûs re ne



Hikmet Hebîb eşkere kir ku MSD'ê di hevdîtinên dawî yê bi rayedarên Rûs re, cidiyet û erêniyeke baş dftiye. Hebîb diyar kir ku di qonaxa bê de bi encamên li ser erdê, wê ev cidiyet bê dîtin. Şaneyeke Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) 28'ê Tebaxa

borî serdana paytexta Rûsya Moskovê kiribû û bi Partiya Vîna Gel re mûzakereyeke lihevkinirînê pêk anibû. Şandeya MSD'ê ji Seroka Desteya Rêber a MSD'ê Îlham Ehemd, cîgirê wê Hikmet Hebîb, Hevserokê Partiya Yekîtiya Suryenan Senherîb Barsûm û nûnerê MSD'ê li Misrê Sîhanok Dîbo, pêk dihat. Têkildarî serdanê, cîgirê seroka Desteya Rêveber a MSD'ê Hikmet Hebîb wiha axivî: “Ser-dan li ser vexwendina Weza-reta Derve ya Rûsya pêk hat. Danûstandinên domdar bi

Partiya Vîna Gel re hebûn, ku bi mûzakereya lihevkinirînê bi encam bûn û yek ji xebatên ku li paytexta Rûsyayê pêk hatine bû.” Hebîb eşkere kir ku Fermanda-riya Rûsyayê hin nêrînên şaş li ser MSD'ê girtibûn ku bi riya hin aliyan hatibûn ragihandin û got, “Me di serdana xwe de projeya MSD'ê û Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê zela kir û me di kesayeta birêz Lavrov de fermandariya Rûsya ji rastiya rewşê agahdar kir û jê re behsa projeya niştîmanî ya parastina yekirina xaka Sûriyê kir.”

Nûnera NY bi QSDê û Rêveberiya Xweser re civiya

Nûnera taybet ya Kar û Barê Za-rokan û Nakokiyên Çekdarî ya NY cîngavên online bi Fermandariya QSD'ê û Hevserokatîya Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê re li dar xist. Di civînê de fermandarê giştî yê QSD'ê Mezlûm Ebdî, hevserokê Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Ebid El-Mihbaş, fermandarên YPJ'ê Newroz Ehmed, herwiha Nesrîn Ebdullah û Rêdûr Xelîl ji Nivîsgeha Têkiliyên QSD'ê û nuqtîya têkiliya leşkerî bi NY re amade bûn.

Di civînê de plana hevbeş a bi NY re ya 29'ê Hezîrana 2019'an û pêngavên ku ji hêla QSD'ê û Rêveberiya Xweser ve pêk hatin, hatin nîqaşkirin. Virginia Gamba serkeftinên QSD'ê û Rêveberiya Xweser pêk anînê, pîroz kirin. Li aliyekî din jî li ser rewşa zarokên malbatên DAİŞ'î yê ne sûrî yê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ne û derfetên vege- randina wan li welatên wan hatin nîqaşkirin. Herwiha gotin divê serdanên xwe li navendên girtinê yê ku tê de zarokên malbatên DAİŞ'î hene bike, da ku pêdiviyên wan bi cih bîne.



werin dîtin. Her du aliyan piştrast kir ku navendên girtinê ne cihên guncaw in ku zarok tê de biminin. Lewr bûne qurbanîyên şerê çekdarî. Herwiha Mezlûm Ebdî got divê NY serdanên xwe li navendên girtinê yê ku tê de zarokên malbatên DAİŞ'î hene bike, da ku pêdiviyên wan bi cih bîne.

TEV-DEM'ê banga hevgirtinê li partî û tevgerên kurdî kir

Tevgera Civaka Demokratîk bêdengîya hikumeta Iraqê, hiku-meta Herêma Kurdistanê û hin partiye û Başûrê Kurdistanê ya li hemberî destwerdana artêşa Tirk a dagirker li xaka herêma Kurdistanê, bi daxuyaniyekê şer-

mezar kir. Di daxuyaniyê de wiha hat gotin: Ji berî 100 salî ve, artêşa Tirk a faşîst li dijî gelên Rojhilata Navî, Kurd, Erebb, Suryan, Aşûr, Er-men û Kildan komkujiyan dike. Li hemberî vê rewşê hêzên

navneteweyî ku banga azadî û demokrasîyê û mafên mirovan dikin û qaso qanûna navneteweyî, serweriya dewletan û mafê gelan ê diyarkirina çarenûsê diparêzin, li hemberî vê rewşê bêdeng in. Hêzên gerîla di 3 mehên berx-

‘Koalisyona Kurd-Ereb mûmkin e kaosa herêmê çareser bike’

Nivîskar û rojnamevanê Misrî Îlhamî El-Melêcî diyar kir ku hikumeta Tirkîyê bûye dijmina sereke ya gelên azadîxwaz ên herêmê û got, tinekirina siya-seta dagirkeriyê bi yekkirina keda hêzên demokratîk pêkan e.” El-Melêcî bal kişand ser inisiyatîfa hêzên demokratîk a birêxistinkirina hemleya piştgiiriya pêngava Koma Civakên Kurdistanê ya aliye Ereb, da berhemên fikrî yê Rêber Ocalan nas bikin. Derbarê siyaseta Tirkîyê ya dagirkirinê û belavbûna li Roj-hilata Navî û armanca KCK'ê ya hemleya “Na ji tecrîd, faşîzm û dagirkeriyê re, dem dema azadiyê ye” nivîskar û rojnamevanê Misrî Îlhamî El-Melêcî ji ANHA re axivî.

El-Melîcî got, armanca van si-yasetan talankirina xêr û bêrên welatên Ereban e û jihevxiştina cîhana Erebî ji dewletên piçûk û wilayetan re ye, ku bi vê yekê lawaz dibin û derfeta vege- randina xewna Osmanî çêbe. Tirkîya ku Împeratoriya xwe ya Osmanî bi dagirkirina gelek welatên Ereban bi sedê salan pêk anî, dixwaze împeratoriya xwe ji nû ve li ser hesabê Ere-ban vege- rîne.



Ji ber wê pêngavên bi vî rengî pir baş in. Bi taybetî ku di demekê de li herêmê ji ber komên terorîst ên temsîla rejîma Tirk dikin û derfetê didin derketina projeya dagirkeriyê û faşîzmê li herêmê, stres heye. Ev yek tê wateya ku rejîma Tirk dijminê sereke yê gelên azadîxwaz ên herêmê ye. Ji ber wêpewîstî bi yekkirina kedên hêzên demokratîk û gelên herêmê ye, ji bo bersivdayîna vê dijmini heye. Birêz Abdullah Ocalan sem-bola têkoşin û hêzê ji aliye azadîxwazên cîhanê yê ve serdemê ve tê pejirandin. Herwiha ronakbîrekî pêşeng e ku ji gelê xwe, gelên herêmê û azadîxwazên cîhanê re nîmûneya ronakbîr, rewşenbîr û têkoşerê bi hêz pêşkêş kir. Lewra, divê hemû azadîxwazên cîhanê ji bo destpêkirina pêngavên herêmî û navdewletî yê azadkirina Rêber Ocalan, hevgi-rtî û hevkar bin.

wedana efsanewî de karibûn gelê Kurdistanê li Başûr, Bakur û Rojava li hemberî dewleta Tirk a dagirker rake ser piyan û ser-bilind bike. Lê mixabin, hêzên ewlekariyê yê başûr bi fermana hikumeta herêmê xwepêşandanên aştiyaran çewisandin û bi heza-ran rojnamevan û çalakvanên malperên tevna civakî girtin, da ku têkçûna artêşa Tirk û sûcên wê eşkere nekin. Bi yekbûna gelan wê arêştê Tirk a dagirker ji xaka Sûriyê û Iraqê derkeve û wê li Herêmên Parastinê yê Medya jî bi rêbazên rewşa yê li gorî qanûna



navneteweyî ku mafê berxwedanê dide gelan, t êk biçe. Em Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM), em bang li hêzên azadîxwaz û berxwedêr ên li Bakur, Başûr, Rojava û Rojhilatê Kurdistanê, Rojhilata Navî û Cîhanê dikin ku li hemberî faşîzmê, bi taybetî li hemberî dagirkeriya Tirk yek bin.

Şandeyeke Brîtanî serdana Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir

Şandeyeke Brîtanî bi serokatîya Berdevkê Taybet ê Brîtanya yê berpirsyarê Sûriyê Martin Longden, ji bo nîqaşkirina rewşa siyasî û koalîsyona hevbeş li dijî DAİŞ`ê, serdana herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir.

Hevserokên Daîreya Têkiliyên Derve ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Dr. Ebdulkerîm Omer û Danya Remedan, Seroka Desteya Jinê Zeyneb Saroxan û rêveberê t êkiliyên dergehê Sêmalka, li dergehê Sêmalka şandeya Brîtanî pêşwazî kirin. Ji bo nîqaşkirina gelek dozên siyasî, şerê li dijî DAİŞ`ê, rêbazên pêşgiirtina belavbûna vîrusa Koronayê li herêmên Ba-kur û Rojhilatê Sûriyê, her du ali-

yan li avahiya Daîreya Têkiliyên Derve ya li bajarê Qamişlo het a saetêkê civîneke girtî pêk anin. Piştî civînê, Hevserokê Daîreya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Ebdulkerîm Omer da xuyakirin ku Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi vê serdana girîng ji bo me û ji bo Brîtanya, pir kêfxweş e û got, “Nexasim ku em hevalbendên koalîsyona li dijî DAİŞ`ê ne.”

Omer herwiha diar kir ku her du aliyan rewşa mirovî li herêmê û astengiye û pêşiya wan, nexasim bi belavbûna vîrusa Koronayê û bandora wê li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û parvekirina rêbazên xweparastinê, nîqaş kirine. Di serdanê de Daîreya Têkiliyên Derve a herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê zarokeke bi esil Brîtanî (4) radestî şandeya Brîtanya kir.



Cenazeyê endamê Tevgera Ciwanên Şoreşger Mistefa hat veşartin

Cenazeyê endamê Tevgera Ciwanên Şoreşger a Sûriyê ya kantona Efrînê Mehmûd Mistefa bi merasimekê hat veşartin. Welatiyan cenazeyê şehîd Mehmûd Mistefa ji ber nex-weşxaney a Avrîn a bajarokê Fafînê girt û ber bi gorîstana Şehîdên Komkujiya Til Rifet û Aqîbayê ve bi rê ketin. Di merasima li gorîstanê de endamê Meclisa Malbatên Şehîdan a Kantona Efrînê Receb Mistefa axivî û rola şehîdan di pêşxistina t êkoşinê de destnîşan kir.” Di merasimê de, endamê Tevgera Ciwanên Şoreşger a Sûriyê ya kantona Efrînê Reşîd Efrîn ji banga tevliwbûna şoreşê li ciwanan kir û got, “Divê ciwane rola xwe bi cih bînin û t êbikoşin. Em di pêvajoyeke



çarenûsî de ne, eger em pa-rastîna xwe nekin emê nika-ribin armancên xwe bi cih bînin.” Endama Komîteya Perwerdeya Civaka Demokratîk a kantona Efrînê Hiket Hisên nasnameya şehîd xwend û radestî malbatê de hat kirin. Şênîyan cenazeyê şehîd di nava durîşman de spart axê.

Li Idlibê Kirîza Iqtîdara Tirkîyê Tê Jiyan	
İdrîs HENAN	
Nêzî şeş mehan di ser lihevkirina herdu serokên Rûsya û Tirkîyê, Pûtîn-Erdogan a li ser Idlibê re derbas bûn. Di 5 Adara isal de li Moskoyê serokên herdu welatên navborî di derheqê ge-neşeya li bakur rojavayê Sûriyê ya li Idlibê lihev civiyan. Li gorî tişta bi ragihandinê re hatiye parvekirin, dê li wê herêmê herdu aliye dijber “Rejîma Sûriyê û çeteyên Tirkîyê” pabendî agirbes-teke domdar bin. Ev yek dê bi dewriyeyên hevbeş ên li ser rêya M4 “Heleb-Lazîqiyê” û avaki-rina herêmeke ewle li ser herdu qiraxên rêya M4 bi kûrahiya şeş kilometroyan pêkan bûya. Ji bo berjewendîya herdu aliyan	
a aborî û di encama lihevkinirînê Aslana de, gengaze ku lihevkirina Moskoyê, li ser kaxezan, gengeşeya leşkerî û pevçûnên herdu aliye û girêdayî Rûsya û Tirkîyê dabe rawestandin, lê pratîka rojane ya li Idlibê ne li gorî wê lihevkinirînê bû. Dijberiya armancên herdu aliyan rê nade ku lihevkinirîn domdar be. Gelek nakokiyên berjewendîyan di navbera herdu aliyan de hene. Çi li Idlibê û tevahî Sûriyê dibin û çi ji li Lîbya, Ukranya, Ermînya û Azarîcanê dibin. Dibe ku lihev-kirina Moskoyê tevgera balefirên şer ên Rûsyayê heya astêkê dabe sekinandin, lê di xala duyemîn a lihevkinirînê de “korîdora ewleyî ya bi qasî şeş kilometroyan a li ser	

Asayîşa Hesekê motorsiklêteke bombebarkirî bêbandor kir

Tîma Yekîneya Endezyariyê ya Hêzên Asayîşa kantona Hesekê motorsiklêteke bombebarkirî bêbandor kir. Motorsiklêt li nêzî çerxerîya Dêra Asur a taxa Til Hecer a bajarê Hesekê hatibû bicihbirin. Di dema bêbandorkirînê de, Hêzên Asayîşê cih girtin û sîvil jê dûrxistin. Di encamên lêkolînên Tîma

Yekîneya Endzyariyê de, derket ku madeya teqemeniyê ji 5 kg madeya TNT'ê pêk dihat ku dix-westin bi telefona destan ji dûr ve biteqînin. Endamê rêveber ê Hêzên Asa-yîşa Kantona Hesekê Şîvan Silêman diyar kir ku nasnameya xwediyê motorsiklêtê hat naski-rin û lêpirsin hatiye destpêkirin. Şîvan Silêman bang li welatiyan



kir ku kesê madeyên biguman bibîne, hêzên wan agahdar bike.

Şênîyên Til Temir şehîdekî xwe spartin axê

Bi sedan şênîyên navçeya Til Te-mir ya kantona Hesekê beşdarî merasima cenazeyê endamê Hêzên Asayîşê Fewaz Emîn bûn, ku 14' Îlonê li ser erkê xwe şehîd bû. Di merasima li gorîstanê de bi navê Hêzên Asayîşê endamê rêveber Selman Nûhî û bi navê malbata şehîd Mehmûd Emîn axivîn.

Di axaftinan de sersaxî ji malba-ta şehîd re hat xwestin û behsa keda şehîd Fewaz ji bo xizmeta welat û gelê xwe kirî hate kirin. Herwiha behsa rola Asayîşê û şehîdan ya di parastina aramiyê de hat kirin. Piştî axaftinan nasnameya şehîd Fewaz Emîn hat xwendin û radestî malbata wî hat kirin. Di dawîya merasimê de



cenazeyê şehîd di nava tilîliye û dayîkan û durîşmên “Şehîd Na-mirîn” de hat veşartin.

herdu aliye û rêya M4' ti pratîkeke berbiçav nîn bû. Li gorî lihevkinirînê pêwîst bi wezaretên paraştinê yê herdu welatan di nava heft rojan, piştî lihevkirina Pûtîn-Erdogan de pîvanên vê xalê destnîşan kirbana, lê ev yek pêk nahat û ne tu kesî ji qalê kir. Xuyaye ku herdu aliyan tevî nakokiyên xwe yê zêde tenê rêya M4 xîstina aramaca xwe. Minewreyên leşkerî yê hevbeş ku li rojhilatî Idlibê pêk hatibûn, regekî nixumandina nakokiyên herdu aliyan bû. Lê qewiminên li Idlibê û daxuyaniyên herdu ali-yan nîşan dikirin ku lihevkirina Moskoyê nikare ji ve zêdetir li ber xwe bide. Berovajî danûstandinên herdu aliyan, îroj xalên leşkerî yê Tirkîyê li Idlibê 60 derbas kirine. Zêdetirî 20 hezar leşkerên Tirk, alavên leşkerî û sîtemên paraştina asîmanî yê pêşketî li wir bi cih kirine. Gelek dosyayên dîtir ên di navbe- ra herdu aliyan de ku bandorê li

itîfaqa Idlibê dikin ketine dewrê. Li kêleka Ermînya û Azerbîcanê yek ji girîngtîrîn aloziya herdu aliyan ku bazara Sûriyê û Idlibê li ser tê kirin, mudexeleya herdu aliyan a nava Lîbyayê ye. Li Lîbya jî herdu alî di bargehên dijber de ne. Disa pêşketin û itîfaqên Bakur û Rojhilatî Sûriyê siya xwe li şiklê t êkiliya herdu aliyan dike. Taybet piştî itîfaqa MSD û partiya Vîna Gel li Moskoyê. Tirkîyê vê yekê weke fîrsend bikar tîne ku jîmara hêzên xwe li Sûriyê û Idlibê zêde bike û dagirkeriya xwe mayînde bike. Rûsya jî hewl dide projeya xwe ya kevin û nû ya li dijî bloka NATO bi deştê Tirkîyê pêk bîne. Nîqaşên herdu aliyan ên li ser M5 vê dawiyê diyar dike ku herdu alî di bin bandora dosyayê dîtir de nekrîne li hev bikin. Hevdîtînen şandeya Rûsya bi hemtayên xwe yê Tirkîyê re van rojên borî de jî bi bin ketine. Ji xwe wezîrê karê derve yê Tirkîyê Çawîş Oğlo ev yek bi zelaî anî ziman û pêvajoya

danûstandinan weke ‘Kullek û bêber in’ bi nav kir. Li gorî çapemeniya Rûsyayê jî, Tirkîyê xwestiye di berdêla Idlibê de bazara Mînbic û Til Rifetê bike. Li gorî heman ragihandinê ev yek ji aliye Rûsyayê ve hatiye redkirin. Ji lew re ev çend rojin hemû kom û gîrûpên cete yê Tirkîyê li Idlibê li ser banga dagirkeriya Tirk di rewş-ke seferber de ne ku pêvajoya siyasî li Idlibê qediya ye û wê deşt bi oparasyonên leşkerî bikin ku herdu prezgehên Hema û Helebê bigirin.? Diyare kirîza ku faşîzma Tirk li hundir û derve dijî wê dawiyê li iqtîdara AKP û serokê wê Erdogan bîne. Piştî rapora NY (çiqas seranser be jî), helwestên Ewropa û raporên rêxistinên mafên mirovan, blokên nû yê li dijî çilekiyên Tirkîyê t ên avakirin û dê tevgêrên terorane yê AKP-MHP sînordar bibin û dê berxwedan Kurdan û gelên bloka Netewa Demokratîk bi biryardarî bi ser keve.